# NEWROZA AZADÎYÊ, PÊVAJOYA AŞTÎYÊ, ASTENGÎ Û XETERÊN LI SER R'ÊYA WÊ Û ÇEND TÊBÎNÎ




**Ezîz ê Cewo**

… Dîsa, va ye, bahar hatye! Dîsa Newroz e!

Belê, Newroz e – Newroza Azadîyê û Aştîyê.

Hem li derveyî K'urdistanê, hem jî li çarhêlên Welêt k'urd di gund û bajaran da, li serê çî'ya û banîyan Cejna Net'ewî – Nwrozê pîroz dikin, û silogana li ser zarê her yekê/î ev e: **"Ji R'êber Apo r'a azadî, ji pirsgirêka k'urdî r'a ç'areserî!"**– Lewra ku ew dizanin, êdî ew jizûva di jîyana xwe da bawer bûne, ku azadîya wan û Welatê wan p'abendî Azadîya Rêberê wan e…

Û K'urdistan bi agirê Newrozê, bi alên r'engîn, bi dîmenên R'êber Apo û bi yên wan, ên ku bi agirê bedena xwe agirê Newrozê gur' kirin – ên Mazlûm Doxan, **Zekiye Alk'a-nê, Rahşan Demîrelê, Bêrîevanê, R'onahîyê, Sema Yûceyê!...** Û dîmenê wan pîrozbahîyan bi têlêvîzîonan, bi kanalên cuda yên medya civakî li her devereke cîhanê digîhîjin her k'urdekî û dost û dilxazên gelê k'urd …

Bi dîrokî di demên here teng da T'evgera R'izgarîxwaz û gelê k'urd vîn û r'ayê xwe yê net'ewî bi Newrozê xurt û bilind kirine û nîşanî cîhanê dane. Û ev Newroza jî yek ji wan e, lê yek a nû ye, t'aybet e! Ew bûye r'ûdana helwesta gelê k'urd a piştgirîyê ji bo banga R'êber Apo ya 'Aştî û civaka demokratîk'…

Û dema min li dîmenên pîrozbahîyên vê Newrêzê dinihêr'î, helbestek a demên zar'o-tîya min hate bîra min, ez wê demê şagirtê k'oma 6, an 7-an bûm. Di helbestê da dihat gotin, k'a leşkerekî Art'êşa Sovêtê li qada şer'ê li dijî faşîtan (salên 1941 – 1945-an) çawa p'akr'ewan dibe. Berika dijmin li berîka wî ya li ser sîngê wî – ya li ser dil k'etibûye… Hevalên wî berîka wî vedikin, nasnameya wî ya leşkerî jê derdixin (ev kevneşopîyek bûye!), dibînin, ku berika faşîstan ew qul kirye, ji wê r'a derbaz bûye û dilê wî jendîye. Nasnameyê vedikin, di nav wê da wêneyê jineke navsere dibînin – wêneyê dayîka wî, li pişt wêne nivîsî bû ye: *"Ji bo dayîkek a weha, ji bo welatekî*

*weha, hêja ye, ku mirov şer' bike û p'akr'ewan bibe!"* – Û, eger mirov wê werguhêr'e vê serdema me, ewê bi nêzîke weha derê: *"Ji bo gelekî weha, ji bo welatekî weha, hêja ye, ku mirov şer' bike û p'akr'ewan bibe!"* …

Û, bi dîtina min, her dotek a k'urd, her lawekî k'urd, ê ku ji mala xwe derk'etye û beşdarî r'efên p'arazvanên nirx û r'ûmeta gelê xwe bûye, helwestek a weha di r'ûh û r'ama-nên wan da r'û dane!

Sibê gelê k'urd di p'ayt'ext Amedê da bi mîlîonan berev bibe, ku Newroza xwe pîroz bike û ji bo vê pêvajoyê helwesta xwe bibêje!

Newroza we pîroz be, gelî k'urd û k'urdistanîyên dilsoz, bila ev Newroz bibe p'eyamdara aştî û azadîyê – Azadîya Welatê me û R'êberê Net'ewî!

Ez bi bawer im, gelek k'urdên dilxwaz ên derveyî Welêt xwezîya xwe bi we tînin û dibêjin:

– Xwezî ez jî di nava we da bûma! ...

***

Naha em veger'in ser mijara pêvajoya aştîyê!

Di nava xwendevanên me da hinek pirsan r'û dabû. Û hinek ji wan jî gihîştine ber destê me.

Bi t'aybet, ew dipirsîn:

*– Piştî banga R'êberê gelê k'urd a ji bo aştîyê û agirbesta HPG jî, êrîşên r'êjîma faşîst a T'irkîyayê li ser R'ojava û Herma P'arastinê ya Medyayê kêm nebûne. Ev tê çi wat'eyê, gelo, r'êjîmê em xapandin?*

Mirov li vira dikare çi bibêje?

Di serî da divê bê zanîn, ku konyûktûrên cîhanê yên siyasî, leşkerî û êkonomî hatine guhar'tin. Ev derdorê 41 salan e, ji bo p'ejirandina mafên gelê k'urd ên mirovî û net'ewî Partîya K'arkerên K'urdistanê (PKK) têk'oşînek a ç'ekdarî dimeşîne. Ev şer'ekî neç'arî ye: ne PKK û ne jî gelê k'urd bi giştî ne evîndarê ç'ek û şer'an in. Lêbelê, r'êjîma faşîst a T'irkîyayê r'êyeke dinê nehiştibûye …

Di nava van 41 salên buhurî da PKK çend caran agirbest daxwîyandye, ji nava xwe çend k'omên astîyê ver'êyî T'irkîyayê kirye, û, her çiqas, anegorî qanûnên navnet'ewî û exlaqê mirovî, ew p'eymbirê aştîyê bûne, yek e, r'êjîmê ew hebs kirine û r'ehîne girtine…

Û vê carê jî, her çiqas r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan banga 'Aştî û civaka Dêmokratîk' kirye, lê, yek e, wek ku hûn bi xwe jî dibêjin, xwendevanên hêja, T'irkîya êrîşên xwe didomîne, lewra ku r'êjîm ji aştî, aramî û dêmokrasîyê ditirse, lewra ku ew li ser r'anta şêr' xwe li ser p'êyan digire. Ew bi vê helwesta xwe didin xuyan, ku ji bo astîyê ne amade ne…

Wê demê dê çawa be? – Dibe hinek bipirsin.

Wê demê divê gelê k'urd bi bir'yar bi şêweyên dêmokartîk têk'oşîna xwe bidomîne. Wekî dinê, wek ku tê xuyan, ev camêrana yan tê nagihîjin, k'a pirsên aştîyê û dêmokrasîyê çawa ç'areser dibin, an jî xwe dixapînin… Ya ku ew xiyal dikin, ne pêkanîna aştîyê ye, ew dixwazin gelê me bê p'arastin bihêlin û li hember wî wan t'evkujîyan bidomînin, ên ku kal û bavên wan di dema xwe da pêk anîne. Mirovên ku îro, di sedsala XXI da bi van xiyalan dijîn, an hêsîrên heşê xwe ne, an jî bi derûnî ne t'endurust in… Wekî dinê, xwendevanên hêja, hûn dikarin axavtina endamê Komîtêya R'êvebir a PKK-ê bir'êz Mûrad Karayilan guhdar bikin: https://www.youtube.com/watch?v=xhKsIdRhSso&t=3264s . Û, wisa jî, dema ev gotar êdî ji bo weşanê amade bû, di întêrnêtê da axavtina endamekî dinê yê Komîtêya R'êvebir a PKK-ê bir'êz Dûran Kalkan di Medya Habar-tv da bi t'irkî derk'et. Me vegotina wê ya k'urdî di kanala Bedran Dere da dît, û wê li vira ji bo wan p'arvedikiin, ên ku bi t'irkî nizanin. Fermo, lê guhdar bikin, xwendevanên hêja: https://www.youtube. com/live/d4Sd9-YKZMo , û ji vir û pêva gotin a we ye.

*– Dibêjin, di Tirkîyayê da şaredarê Stenbolê Ekrem Îmamoxlû girtine. Tê gotin, ku Erdoxan, ji bo ku nehêle ew beşdarî hibijartinên serokomarîya T'irkîyayê bibe, ew daye girtin. Wisa jî wî di têk'ilîyên bi PKK-r'a sûcdar dikin. Ev çi lîstik e, gelo?*

Belê ev lîstik e, xwendevanên hêja, û lîstik jî, du alîyên xwe hene. Erê, ew, ku dixwazin Îmamoxlû li ser r'êya xwe bidin hêlekê, her t'erefekî lîstikê ye, hem jî ew hewl didin, ku Îmamoxlû

r’eş bikin û bi wê sîyê biavêjin ser PKK. Ango, wek ku di nav gel da tê gotin, ew dixwazin bi berikekê du ç’ûkan bînin xarê… Hema ew di hesabên xwe da şaş derk’etine, di T’irkîyayê da li dijî Erdoxan û rêjîmê dest bi serhildan û xwepêşandanan bûye, û ewê bi k’uva bibe, di dema pêş me da dê bê xuyan. Vê qasê mirov dijwar bikaribe hinek pêşdîtinan zelal bîne zimên, lewra ku di hewl û t’evgeryana r’êjîma T’irkîyayê da heşmendî (mant’iq) nîne…

Emê bendê bin, k’a ev pêvajoyê bi k’u va bibe…

*– Di nav gel da nêr’înek hatye belavkirin, ku serekfermandarê HSD gênêral Mazlûm Kobanî divê piştî t’evkujîya elewîyan a li herêma beravên Sûrîyayê bi aş-Şaraa r’a nehata bal hev û peyman îmza nekira…*

Hûn dizanin, xwendevanên hêja, dîtinên weha yên bê bingeh ji wê tên, dema mirov bi hestyarî nêzîkî pirsan dibe. Min di gotara xwe ya berî vê da jî di vê derbarê da gotibû, ku hevdîtin û îmzekirinên weha hema wisa bi carekê va di nava r’ojekê da pêk nayên, ku ji bo peymaneke wisa amade bibe û bigihîje ser maseya hevdîtinan û bê îmzekirin, meh pêwîst dikin...

Ji bo wê jî divê tiştek bê zanîn, dema amedekarîyên wê peymanê hatine kirin (1,5 – 2 meh!), wê demê, di wê navberê da agahî gihîştine r’êjîma T’irkîyayê. Ji xwe tê zanîn, ev biraderana, ên ku piştî r’eva Beşar Esed hatine Şamê, li ser ki’lafe û k’elaxê r’êjîma baasî r’ûniştine, ji nav DAÎŞ-ê derk’etibûne, jixwe T’irkîya jî baregehek a mezin û bi hêz a DAÎŞ-ê ye, Erdoxan jî – emîrê wê r’êxistina têro’ra navnet’ewî (DAÎŞ) yê ne formal e û îro jî gelek k’om û k’omikên di nava HTŞ-ê da r’astedêr bi T’irkîyayê va girêdayî ne … Û hema van k’oman jî ev t’evkujî ji bo wê pêk anîne, ji bo ku nehêlin ew r’êkevtin pêk bê… Û piştr’a sê wezîrên T’irkîyayê tên Şamê, ji bo ku pêvajoyê hildin bin kontrola xwe, an hûrbînîyên wê ji bo xwe baş r’onî bikin û di pêşer’ojê da astengîyên dinê çê bikin. Ji xwe êrîşa ser Kobanîyê û t’evkujîya gelê medenî ji hêla r’êjîma faşîst a Erdoxan-Baxçelî va, ji bo heman armancê pêk hatine. Di encama wan êrîşên hovane da neh kes cangorî bûn û bi dehan jî – birîndar.

Em ji dil serxweşîyê didin malbatên cangorîyan û t’evahîya gelê R’ojava, ji birîndaran r’a jî – zûtirîn t’endurustbûnê dixazin!

Helbet, ev jî pêvajoyek e, her yek lîstika xwe dilîze… Erdoxanê wisa hêsa r’ûnenî, ew dizane, dem ne yên berê ne, ku her tişt nîne, ku dê ji destê wî bê, û ew bikaribe xwestina xwe pêk bîne, lewra jî ewê heya dawîyê k’irêtîyên xwe bidomîne.

Hema divê bê zanîn, ku yên hemberî wî jî ne wisa sade ne!

Ya sereke, ew e, ku gel neyê provokatsîonan, têk’oşîna xwe ya dêmokratîk bi bir’yar bidomîne. Eger di bajarên mezin da çend r’ojan bi mîlîonan mirov derên qadan û jîyanê bicemidînin, dê t’ext û t’acê zulmê yê r’êjîma faşît biheje, û gelê Tirkîyayê bi giştî dê ji vê stêmk’arî û mijovdarîya klîka faşîst r’izgar bibe…

Ya sereke, divê tiştek bê zanîn, bi daxwîyanîya Baxçelî ya destpêkê, rêjîmê xwest pêvajoyê wek xwe r’aster’ê bike, lê bi banga xwe ya 'Aştî û civaka dêmokratîk' R’êber Apo berê pêvajoyê berbi r’êgeha dêmokrasîyê va zivir’and, ji bo wê jî r’êjîm di panîkê da ye…

## Li şûna peyvnivîsarê!

(P’arç’eyek ji gotara me ya “R’ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r’êjîma baasî, pirsgirêka k’urdî r’êyên ç’areserîya wê!”)

Naha li ser vê notê em gihîştin pirsekê ya ku bi xwe r’a r’êzek pirsên dinê jî anîn.

Ew pirsa banga Dewlet Baxçelî ya, qaşo, ji bo ç’areserîya pirsgirêka k’urd e!

Helbet ev jî bi serê xwe pirsek e – çima r’êjîmê ev erk’a hema da Dewlet Baxçelî – serokê T’evgera nijadp’erest û hevp’arê Erdoxan ê r’êjîma faşîst di T’irkîyayê da?!

Li ser asta konspîrologîyê di vê derbarê da li vir û wir hinek şiroveyên cuda pêk hatine, lê r’êvebirîya T’evgera R’izgarîxwaz (K’CK) ji bo hemû pirsan bersîv û şiroveyên zelal dane.

Naha ez dixwazin balê bik’işînim ser pirseke r’êgezî: “Gelo ev daxwîyanîya ku ji hêla nûnerên r’êvebirîya r’êjîma faşîst va hatye dayîn, mabesta wan destpêka pêvajoya aştyê bûye?”

Eger mirov bi heşmendî pirsê binirxîne, ne ku bi hestyarî, bersîv yek e – na!

Lê ev çi bû?

Wek ku tê xuyan, di nava sazî û dezgehên navdewletî da li ser pirsa ç’areserîya pirsgi-rêka k’urdî, azadîya R’êber Ocalan hinek goftûga pêk hatine, û hinekan, şêwir dane r’êvebi-rîya T’irkîyayê, ku dem pêr’a gihîştye, vê pirsê bi r’êyên aştyane ç’areser bikin.

Ji bo ku pisgirêka k’urdî bi r’êyên aştyane bê ç’araeserkirin, R’êberê Net’ewî r’êzdar Ocalan ne ku t’enê r’êyên praktîkî pêşnîyar kirine, her weha, di vî warî da ne carekê û ne jî dudyan gav avîtine. Ewî wisa jî, wek bîrewarekî serdemê yê bêhemp’a, di berhemên xwe da jî bi zanistî r’ê û r’êbazên ç’areserîyê r’avekirine û dane pêş. Û ew berhemên wî jî di cîhanê da bi dehan zimanan hatine weşandin. Û li şûna guh bidin bang û hewlên wî, ev êdî 26 sal e, ew wek girtîyê azadîyê li girava Îmralîyê di hebsê da, wek r’ehîneyê bêdadîya navdewletî dimîne ...

Û r’êjîmê ev erk’ bi zanebûn sparte Dewlet Baxçelî, û bi devê wî banga ç’ekberdanê li PKK-ê kir, lewra ku wan hêvî dikir, heya, dibe ku, ew bi bawer bûn jî, ku k’urdê wê pêşnîyarê r’ed bikin, û ewê jî ji patronên xwe yê derva r’a bibêjin – a, we dît, em êdî çi dikarin bikin?

Lêbelê, ew di hesabên xwe da şaş derk’etin!

R’êvebirîya T’evgera Net’ewî dizanibû, k’a yên ku li hemberî wan sekinîne, k’î ne!

Û hevdîtinên şanda DEM Partîyê bi R’êberê gelê k’urd r’a pêk hatin, r’êzdar Ocalan dîtina xwe ya di derbarê ç’areserîya pirsgirêkê da anî zimên û da zanîn, ku ew amade ye, û ew hêza wî hye, ku pêvajoya aştyê bibe sêrî...

Van r’ojên dawîyê wisa jî hate gotin, ku R’êber Ocalan dê p’eyamek a vîdêoyî bişîne – û ew dikare 15-sibatê, yan piştî wê pêk be! Û hemû bi hêvîyek a mezin ç’av li r’ê ne, k’a R’êberê Net’ewî dê çi bibêje.

Di vê navberê da gelê k’urd û T’evgera R’izgarîxwaz, sazî û r’êxistinên cuda jî k’arên xwe yên ji bo azadîya r’êberê xwe û pêvajoya aştîyê didomînin. Di welatên cuda da hevdîtin, konferans û civînên cuda pêk tên. Di bajarên K’urdistanê û T’irkîyayê da meş û mîtîngên

piştgirîya pêvajoya aştîyê pêk tên – gel li ser p’êyan e... Û hewlên r’êjîmê, yên ku ji bo têkbirina pêvajoyê hatibûn dayîn, T’evgerê werguhêrî pêvajoya r’astîn kir!

Û lewra jî r’êjîma Tirkîyayê bêhtir har bûye û ji hêlekê va êrîşên xwe yên li ser Herêma Xweser a Bakûr-Rojhilatê Sûrîyayê bi barbarî didomîne, ji hêla dinê va dest dide ser şareda-rîyên Bakûrê K’urdistanê û gotinên xwe yên xilmetbûyî dubare dike, ku divê PKK, HPG, YPG û HSD dest ji ç’ekan berdin!

Mirov ku van bangan dibihê, bêyê r’ayê wî pirsek tê ber heşê wî – gelo ev mirovên van bangan dikin, ser heşê xwe ne, an hatine zombîkirin? Qey bibêjî, ew ji dû eyneya xar a ç’îrokî va ji sedsalên navîn derbazî serdema me bûne!

Bapîrên me ji bo yên wek van gotine – evan dû k’êşa karwanan mane. Cîhan pêş va diçe, ya van, hê di nava xewnên sêlcûkîyan û osmanîyan da bawîşk tên wan!

Ma, gelo ew bi xwe ji wan gotinên xwe bawer dikin? Hebûna vê r’êjîma hov û barbar bi xwe hildana ç’ekan li k’urdan ferz kirye û îrojî ferz dike, heya eger t’evger û r’êxistinên k’urdan û ç’ekên wan nînibûna jî, ewana dê ji bo p’arastina xwe ya fîzîkî û nirxên net’ewî t’evger û r’êxistin ava bikirana, dê ç’ek hildana û dijî zulm û zordarîya van barbaran derk’etana pêş!

Lê îro T’evgera Net’wî ji her demê bêhtir bi hêz û berfirehtir bûye, dost û dilxwazên wê di cîhanê da zêde bûne, û, eger ev r’êjîm vê nebîne, dê bi xwe têk her’e!...

Û ya sereke, her çiqas r’êjîma faşît a T’irkîyayê k’arên xwe yên r’eş li hember R’ojava didomîne jî, herr’oj Bendava T’işrînê û P’ira Qreqozaxê û gund û bajarên herêmê dide ber t’opebaranan, li hember gelê sivîl t’evkujîyê pêk tîne, yek e, gel r’anewaste, qelfe bi qelfe k’omên nû diher’ikin-diçin, bi bedena xwe bendava xwe dip’arêzin...

R’ast hatye gotin – gelê ku nexwaze bimire, hîç kesek nikare wî bikuje! – Hemma, heyf, ku yên wek Erdoxan û Baxçelî evê r’astîyê tê nagihîjin!

Emê hîvîyê bin, heya banga R’êberê Net’ewî digihîje gel. Gelê me bi bawer e, ku r’êberê wî dê r’ewşê binirxîne û ji bo vê serdemê û r’ewşa heyî r’êyên ç’areserîyê destnîşan bike... Piştî wê dê dyar bibe, k’a gelê me û sazî û r’êxistinên net’ewî divê di vê r’ewşê da çawa t’evbigerin...

(https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎYAYÊ_PIŞTÎ_TÊK_ÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_URDÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ )